

Solidarity with the affected

No platform for the perpetrator

סולידריות עם הקורבנות לא לתת במה לטרוריסטים
Solidarität mit den Betroffenen Keine Bühne dem Täter
Mağdurlarla dayanışma Faillere sahne yok
Солидарность с пострадавшими Не дадим рупор преступнику
Piştgirî bi maxduran re Ji cirmkeran re meydanê nehêlin

21. Dezember 2020
08:00 - 18:00 Uhr
Landgericht Magdeburg

Kundgebung zur
Urteilsverkündung im
#HalleProzess

Kurdisch

Bangewazî

Roja 21ê meha 10an a sala 2020an demjimêr 8ê sibehê heya 6ê êvarî - dadgeh di dosyeya dosyeya naskirî bi #HalleProzess de biryara xwe distîne

Li pêşberî dadgeha Magdeburgê lihev bicivin

„Hevalbendî bi berketiyan re - tawanbar nabe derkeve holê“

Havîna sala 2020an dosyeya dadgehê li hemberî rastgirê tundrê yê bajarê Halle destpê kir. Wî roja 9ê meha 10an a sala 2019an bi armancên dijatiya Cihûyan, nijadperestî û dijatiya jinan êrîşek li hemberî kinîse û herwisa kababxaneyê Kiez li wî bajarî pêk anî û tê de du kesan bi navên Cana Lanj û Kiwîn Şiwartz jiyana xwe ji dest dan. Wê demê 69 kes di nav kinîsê de bûn ku bi dijwarî karîbûn rizgar bibin. Dema ku bikuj direviya, hin kes jî li kolana bi navê Magdeburgerstraße li bajarê Halle û herwisa li Wiedersdorf li nêzîkî Landesbergê hatin birîndarkirin ku birîna hin kes ji wan kûr bû.

Piştî 25 rûniştinên dadgehê, niha êdî rûniştin bi dawî tî. Dadgeh bi standina biryarê, rûniştin diqedîne lê belê ji bo lihemberderketina êrîşên bi vî rengî yan jî ji bo dijatiya faşîstên nû, hêleke taybet tine ye.

Weke rojên berê yê rûniştinên dadgehê, wê piştî dawîhatina rûniştinên dadgehê, civîneke din li pêşberî dadgeha Magdeburgê bê lidarxistin. Armanca me ji vî civînê, pêkanîna rewşeke hevgerî ye ji bo kesên ku ji êrîşê hatin rizgarkirin, ji bo malbatên qurbaniyan û herwisa kesên ku gilî kirine. Herwisa em hebûna van pirsyan jî rexne dikin ku bê bersiv mane û rewşa civakê, pêkhatiyên dewletê û raportên ragihandinê di warê tundûtêjiya rastgirî de jî rexne dikin.

Di warê yasayî de, dadgeh di serî de weke tawaneke kesane yan jî taybet dihat lidarxistin. Tiştê ku hatiye selimandin, ev e ku wî ne di rûniştinên dadgehê de kar û kiryarên xwe înkâr kirine û ne jî poşman bûye. Li bendê ye ku ew bi girtîgeha hertimî bê sizakirin. Heya niha gelek

pirsyar bê bersiv mane; Heke êrîşa li dijî Aftaks İbrahîm û İsmet Tekîn weke êrîşên bikujane neyên binavkirin, wê demê ew kes çawan dikarin li pêşberî yasayê, wekheviya xwe bi dest xwe ve bînin. Gelo çima karnas û rojnamevan, li ser mijara rastgirî û çalakiyên li ser hêla Întêrnêtê zêdetirî lêkolînerên polîsan dizanin? Kîjan mêkanîzm dikarin ji dadgehê bêne standin û bikevin pêşberî aliyên dervey dadgehê? Di encamê de jî pirsyar ev e ku di encama wê êrîşê de û bi kiryarên wê, kîjan encamên siyasî û civakî çê bûne? Niha ji kîjan ekteran tê xwastin ku sersaxiyan bikin kiryar? Nerîn û hêviyên qurbaniyan û malbatên wan ji bo pêşerojê û ji bo lihemberderketina van bûyeran û nirxandina wan çî ne? Pêwîstiya wan bi qerebûkirin û rêzgirtinê çî ye?

Em dixwazin roja 21ê mehê di civînekê de li pêşberî dadgeha navçeya Magdeburgê mijûlî van pirsyan û hin pirsyarên din bin. Nerîna kesên ku gilî kirine û herwisa kesên ku ziyar li wan ketiye wê bêne nirxandin. Herwisa biryar e rewşeke din ji bo rêzgirtin ji Cana û Kiwîn bê pêkanî. Ji bilî wê, karnasên ku dosye şopandine, wê kurteyekê amade bikin.

Ew tiştê ku li Halle çê bû, take tiştê nebû ku rû da. Ew, mijara beşek ji berdehamiya siyasî ya tundûtêjiya rastgirî ye. Heyameke kin piştî wê êrîşê ku li bajarê Halle çê bû, sala 2020an jî êrîşeke nijadperestî li bajarê Hanau çê bû ku di encamê de 10 kesan jiyana xwe ji dest dan. Nerînen faşîstî, dijatiya Cihûyan, nijadperestî, dijatiya jinan û regezxwazan, di kevanan vî civakê de hatiye berfirehkirin. Em pêşbînî dikin ku bikujê Halle, heman kiryar pêk anîye ku gelek kes li vî welatî li vî karî difikirin.

Ev, take tiştê nebû ku çê bû û take bikuj jî nebû, ku heye! Têvî xwepêşandana roja 21ê meha 12an bibin û van peyaman bi xwe re bînin; Hevalbendî bi berketiyan re - tawanbar nabe derkeve holê!

Roja ku biryar ji aliyê dadgehê ve tê standin, em dixwazin bi we re li kolanan hevgerî bin! Ji ber ku li gor me, dawîhatina proseya dadgehê, nayê wateya dawîhatina êrîşê û wê civakê ku ev kiryar pêk anîne.

Solidarity with the affected

No platform for the perpetrator

סולידריות עם הקורבנות לא לתת במה לטרוריסטים
Solidarität mit den Betroffenen Keine Bühne dem
Täter Mağdurlarla dayanışma Faillere sahne yok
Солидарность с пострадавшими Не дадим
рупор преступнику Piştgirî bi maxduran re Ji
cirmkeran re meydanê nehêlin

21. Dezember 2020
08:00 - 18:00 Uhr
Landgericht Magdeburg

Kundgebung zur
Urteilsverkündung im
#HalleProzess

Kurdisch

Kiryarên nexweciî - bangewazî ji bo tevlibûnê

Ew kesên ku nikarin biçin Magdeburgê, dikarin ji bo nîşandanan hev girtîbûna xwe bi me re, ji van riyên mifahê bistînin:

Bênêr, Plakard yan jî postêran bi rengê çê kin û şeva berî wê, bi pencereyên xwe ve daleqîn û bajar pê bixemlînin. Heke hûn hez bikin, dikarin wêneyên wan bigirin û bi #halleprozess li ser torên civakî parve bikin.

Hatiye pilankirin ku kar û çalakiyên me di riya kanala azad ya Magdeburgê re bê weşandin. Ew çalakî dikare ji aliyê hemû kesan ve bi awayekî vekirî bê şopandin.

[Derbasî navê vê lînkê bibe]

Radio Corax jî ji bajarê Halle, wê dawiya rojê raportên xwe pêşkêş bike. Bi vî rengî hûn dikarin li Radio Coraxê guhdarî bikin;

Ji demjimêr 1ê nîvro heya 3ê piştî nîvro û herwisa ji demjimêr 6 heya 7ê êvarî hûn dikarin li bajarê Halle Saale û navçeyên derdorê li ser şepêla 95.9 FM yan jî di riya malpera wê re guhdarî bikin:

Daxwaza alîkariyê;

Me bi piştevaniya giştgir, karî di rojên rûniştinê dadgehê de li ber deriyê dadgehê çalakiyan pêk bînin. Lê belê van kar û çalakiyan, têçû û pere jî pêwîst in. Lewre pêwîstiya me bi awayekî lezgîn bi alîkariya madî heye. Di vî riyê re dikarin alîkariya me bikin;

<https://cutt.ly/khbpwEe>

Corona

Heke nîşanên nexweşiya COVID-19 yan jî Anfulanza bi we re hene, yan jî pêwendiya we bi kesekî/ê re hebûye ku bi vî vîrûsê ketiye, tevî xwepêşandanê nebin. Ji kerema xwe ew kesên ku tevî xwepêşandanê dibin, bila li wir dûrî hev bisekinin û maskê jî bi kar bînin. Hatiye ragihandin ku yasayên sîno-darkirinê di rojên Kirîsmesê de wê bêne

bicîkirin lê ew yasa ne ji bo wan kesan e ku oldar in. Tevî wê jî heke hûn dixwazin bi me re bên, serdana xwe di dema pêwîst de pîlan bikin û bi kesên kêr jî kêmtirîn hejmara malbatan re bikevine rê.

Pereyên çûnê / mana şevê

Ew kesên ku dixwazin bên û di piroseyê de bi me re bin, lê belê pirsgirêkên wan ên madî hene, dikarin bi me re bikevin pêwendiyê û ji bo çûnê û cihê manê, alîkariyê bistînin. Lezê bikin û nameyekê ji me re bişînin. Yan di riya torên civakî re yan jî di riya vî E-Mailê re; antiramd[at]riseup.net

Wajokar;

Tora dijberên nijadperestan a Sachsen Anhaltê

Koma karî ya dijberên nijadperestiyê li Magdeburgê

Çalakvanên koma 9ê Oktobrê li Halle

Koma Çep a ku destwerdanê dike li Halle

Rastgirî Leipzigê dikuje

Rêcîna - Koma Ewropî ya dijberên neteweperestan û ji bo pirrengiyê

Yekîtiya Magdeburgê

Saziya naskirî bi Pira Avê ya Magdeburgê

Agahdariya bêtir: www.antiranetlsa.de